## Daxuyaniya Nepeniya Qeydkirinan

Dabînkarên xizmetên Tundiya Navmalî û Êrîşa Cinsî pabendî qanûna parastina nepeniya qeydiyan in. Di çarçoveya N.D.C.C. 14-07.1-18 de, bêyî pejirandineke zelal ya kesî, yan jî bêyî biryareke derbasdar ya dadgehê ya têkildarî îstîsmara zarokî yan têkildarî bidawîkirina maweya welayetê yan jî heke rewşeke din ya îstîsnayî tune be, agahiyên pênasekirinê yên têkildarî kesekî yan jî têkildarî dîroka dosyeya dozekê nikarin bên weşandin. Ji ber vê yekê, ev agahî di vê rewşê de nikarin bên parvekirin.

## Qanûna Dakotaya Bakur Paragraf 14-07.1-18

**14-07.1-18. Qeydiyên tundiya navmalî yan jî êrîşa cinsî - Nepenî Îstîsna - Ceza**

1. Hemû temsîlkar, xebatkar û dilxwazên beşdarî bernameya tundiya navmalî û êrîşa cinsî dibin divê nepeniya van ên li jêrê biparêzin:
    a. Navnîşan, hejmara telefonê û agahiyên din yên pênasekirinê yên maleke ewle û hêwirgeha ewle ya lezgîn;
    b. Nav, navnîşan, hejmara telefonê, agahiyên pênasekirina şexsî û dosyeya dozê yan raboriya kesên ji bernameya tundiya navmalî yan êrîşa cinsî xizmetê werdigirin; û
    c. Nav, navnîşan, hejmara telefonê, agahiyên pênasekirina şexsî ya temsîlkar, xebatkar yan dilxwazên di çarçoveya bernameyeke tundiya navmalî yan êrîşa cinsî de xizmetan pêşkêş dikin.
2. Agahiyên di binbeşa 1'ê de hatine diyarkirin ne di nav madeya 44-04-18 de ne û ji bilî mercên jêrê nayên aşkerakirin:
    a. Xizmetgirek destûrê dide agahiyên têkildarî wî xizmetgirî yan jî têkildarî xizmên wî xizmetgirî;
    b. Temsîlkar, xebatkar yan dilxwazên bernameya tundiya navmalî yan êrîşa cinsî bi rê ve dibin, biryara aşkerakirina hin agahiyan didin ku ji bo pêkhatina bibandor û ewle ya bernameya tundiya navmalî yan êrîşa cinsî pêwîst in; yan jî ji bo parastina ewlehiya temsîlkar, xebatkar yan dilxwazên bernameyeke tundiya navmalî yan êrîşa cinsî; yan jî ji bo kesekî sêyemîn ku bi awayekî maqûl tê qebûlkirin ku pêdiviya wî bi parastinê heye;
    c. Dadgeheke peywirdar piştî lêkolîneke nihênî û tesbîteke nivîskî ya ku tê de dadgeh qane dibe ku agahî bi awayekî rasterast û taybet eleqedarî diyarkirina îstîsmarkirin yan jî îhmalkirina zarokan e li gorî beşa 50-25.1 yan jî eleqedarî betalkirina mafên dêbavîtiyê ye li gorî beşên 14-15-19, 27-20.3-20, 27-20.3-21, 27-20.3-22, 27-20.3-23, û 27-20.3-24, fermana aşkerakirinê dide; yan jî

   d. Temsîlkar, xebatkar yan dilxwazekî di bernameyeke tundiya navmalî yan êrîşa cinsî de dixebite, bi awayê di beşa 50-25.1-02 de hatiye diyarkirin, di mijara îstîsmar yan îhmala zarokî de agahdar be yan jî gumanên wî yên maqûl hebin.
3. Navnîşan, hejmara telefonê yan agahiyên pênasekirinê yên hêwirgehê qeydiyên îstîsna ne, li gorî beşa di 44-04-17.1 de hatiye destnîşankirin.
4. Her kî li dijî vê xalê tevbigere bi sûcê binpêkirinê tê sûcdarkirin.